## Agahî bo mişteriyan

### Teftîşkirin dest pê dikin li Daîreya Koçberan

Daîreya Koçberan dest bi teftîşkirinan dike ji 15.1.2019 ve.

Hemû kesên bên cihê mişteriyan dê di dergehekî madenî re derbaz bibin ku cihazekî aşkerekirina tiştan heye. Bi teftîşkirinan em dixwazin piştrast bibin ku cihê karkirinê bo mişteriyan, tercumanan, parêzeran û karmendên daîreyê parastî be.

### Xwe bo teftîşkirinê hazir bike û zû were

Bi kêmî 15 deqîqeyan berî dema xwe were cihê hevdîtinê. Teftîşkirin dê hêsantir be, eger hemû tiştên maden tê de ji ber xwe bikî, bo nimûne zincîr û kemerên mezin û wan li ser qayişa teftîşkirinê deyne.

Em pêşniyaz dikin ku hûn zêde tiştan li gel xwe neînin daku teftîşkirina bileztir bimeşe.

Teftîşkeran haydar bike eger di leşê te de parçeyên madenî hebin, bo nimûne protez yan gehekî çêkirî. Herwiha wan agadar bike eger te cihazê dilî hebe û karta wî cihazî li gel xwe bîne eger te hebe.

Herwiha parçeyên madenî yên cilan jî, wek qumçe, dugmeyên madenî yan kevanên madenî yên bincilan jî dikarin bibin sebebê zengillêdanê.

Eger zarokekî biçûk yan berşîr li gel we hebe, zarok jî di himbêza dêbavên xwe de di dergehê aşkerekirina madenî re dibore. Xwarin û tiştên din yên zarokê li ser qayişa ronkirinê tên danîn.

### Her cara mirov were cihê mişteriyan, tê teftîşkirin

Bizane ku cara mirov were cihê mişteriyan, tê teftîşkirin. Eger bo demekê biçî derve û dîsan vegerî cihê mişteriyan, divê ku dîsa di teftîşkirinê re derbaz bibî berî ku bikarin werî hindir.

Teftîşkirin dê pêşî li Helsinki, Pasila Ratapihantie û li Raisio dest pê bikin. Paşî teftîşkirin dê li cihên mişteriyan yên din jî yên daîreyê dest pê bikin.

Teftîşkirinên bi vî awayî herwiha bo nimûne li parlemanê, encumena wezîran û dadgehan jî hene.